Agahadariyek qanûn nasî di pirsiyarên sîgortên civakî de.

Peywendî bi perpirsiyar re
Pirsek yan karek herdem dest pê dike bi dîtina berpirsiyarekî li belediyê yan li daîra sîgortê. Ev çend şîretin/ amojgarîn ku karin başbin û halîkar bin berî mirov here dîtina yê berpirsiyar .
Girînge ku mirov baş amade be bo bigihêje bêje tiştên ku keribin tesîrê li biriyarê bikin. Bêhtirînê caran civîn na be zêdî saetekê. Di vê dema kurt de mirov nagihêje gelekî bêje ser rewşa xwe. Eger mirov wergerek bi kar anî ew dema mirov dixwest tê de hertiştî bêje kurtir dibe. Gava mirov di civînê de rûniştiye, carina dibe ku mirov ji bîr dike gelek tiştan bêje, tiştên ku karibin tesîrê li biriyarê bikin. Ji bo ku ev tişta çênebe başe eger roja berî civînê mirov xweşik û aram li malê rûne û bîr bike di wan tiştên ku mirov dixwaze bas bike ser. Tiştên girîngtirîn binivîse!

Di hundirê civînê de başe eger yek zanibe çi dixwaze û tiştên ne girîng û vala ne bêje, wek bê çawa zor e dan û sitendina yên li hawîr dor bi mirov re. Lê qesid jê ne ewe ku mirov hestên xwe diyar neke. Tişt nabe eger li te diyar bike ku tu xemgîn e yan jî acize.
Eger dîtina mirov ne wek dîrin û bîra yê berpirsiyar be, baştirîn ew ku tu zanibe cuda bûn di çi de ye. Baweriya berpirsiyar bi tiştên hatinin gotin nayê yan ew pê bawer dike lê rewş ne halîkar e ji bo bigihêje vê dahiştinê /danînê.

Nimûne:

Sandra dibêje ku mecbûre gelek caran bi şev ji xew rabe ji bo çavê wê li zaroka wê be, zaroka wê 14 saliye û bi nexweşiya pûçbûnê ye. Ew dixwaze kesek bi şev halîkariya wê bike ji bo bi şev karibe ji xwe re razê.
Berpirsiyar naxwaze vî tiştî qebûl bike. Ji bo çi ? Yê berpirsiyar bawer nake ku zarok gelek caran ji xew ra dibe, yan dibîne ku tiştek e di berpirsiyarî û perwerde kirina dê û bavan de ye ku pir caran ji xew rabin bi şev ji bo çav li zarokekê bikin di vî ´emrî de?

Mirov li vê derê kare pirsiyara yê berpirsiyar bike bê çi dîtina wî ye ser vê pirsiyarê .
Mirov kare pirsiyara berpirsiyar bike ser hoyên ku na hêlin ev halîkariya pêwîst ji mirov re bi dest der ne keve. Eger te tiştek ji tiştan baş tênegihişt, ronahî kirinekê ji berpirsiyar bixwaz. Mirov kare herdem daxwaza bersivek biriyar dayî bike û bersivek ku tê de bi nivîskî ronahî kiribin hoyên ku bûnin sedema ne bidest ketina wê dahiştina ku mirov dibîne ji heqê mirovî ye.
Demek derbas dibe piştî civînê yê berpirsiyar agahdariyekê dişîne, tê de dinivîsîne wê bi çi awayî biriyarê bidin. Ne biriyara herî dawî, tenê pêşniyareke bo biryarê ye.
Gelekî girînge ku mirov baş vê rûpelê bixwîne û rexne bike eger tiştek çewt tê de hetibe nivîsandin.
Belkî belgeyek yan raporek pêwîst be bo ku mirov karibe îsbat bike ku mirov rast dipeyive. Eger wilo be gereke mirov wê belgê peyda bike û bişîne ji berpirsiyar re.

Baş e eger mirov pêşniyara biryarê carek din bixwîne piştî çend rojekî, belkî mirov bêhn teng bû roja yekem. Baş e jî eger tu bi kesekî din re di ser re here, kesek ku bi rewşa te zanibe.
Divê ku mirov bîr bibe ku rexne û nakokê xwe di demek diyar de bişîne, wek di rûpela agahdariyê de hetiye nivîsandin.

Berpirsiyariya dê û bavan

Zaokek nû çêbûyî di pêwîstiya çavdêriyê de ye sala yekem di jiyanê de. Ev tişta bo hemû zarokan e: zarokên bi nexweşiya pûçbûnê û zarokên rehet. Di berpirsiyariya dê û bavan de ye ku zarok çavdêrî û guhpêdana ji wan re pêwîst bi destê wan de bikeve.

Gava zarokek rehet û ne pûçbûyî mezin dibe kare daxwazên xwe bi xwe pêk bîne : zarok kare bi xwe cilê xwe ji xwe bike û ji xwe jî bike, xwarinê bi tenê bixwe , benê sola xwe bi xwe girê bide, diranên xwe firçe bike, here destşûyê tenê bi şev bêyî ku dê û bavê xwe ji xew rabike.
Zarokek pûçbûyî pêwîstiya wî bêhtire ji halîkariyê û çavdêriyê ji hawîrdora xwe. Wek nimûne , gava ku dê û bavê zarokek pûçbûyî daxwaza yarmetîderekî şexsî bikin, daxwaza wan kare qebûl nebe. Bersiv ewe ku di berpirsiyariya dê û bavan de ye ku çavê wan li zarokên wan be. Ev girîng e, lê ma rast e ku hemû kesên 13 salî halîkariya dê û bavan ji wan re pêwîst e gava diçin destşûyê.
Divê mirov bîr bibe ku pêwîstiya zarokek pûçbûyî bên danberhevkirin bi zarokek rehet û narmal di yek ´emrî de.
Gava mirov danberhevkirinekê çêdike bi zarokên ne pûçbûyî û rehet girîng e ku li bîra mirov be ku zarokên rehet pêwîstiya wan ji çavdêriyê û parêziyê kêmtir dibe gava ku mezintir dibin.

Girîng e ku mirov karibe pêwîstiyê îsbat bike bi belgeyekê yan raporekê ji ba doktor. Eger pêwîstiya zarokê bi çavdêriykê û parêziyekê taybetî ye divê lêkolînek çê bibe ser rewşa zarokê, di rê ya keseên zane û xwende de di beşê kar de.

Derbarey belga doktor
Çendek ji mesûlan û berpirsiyaran li daîra kar û barên sîgortê ne zêde zane ne di beşê nexweşiya pûçbûnê de û ne di pêwîstî û halîkariyên pêwîst bo kesên bi vê nexweşiyê ve.
Girînge ku mirov belga doktor bide wan, tê de diyar kiribe û nivîsandibe bê çi nexweşiye û çi pêwîstî û halîkarî pêwîst e ji yê nexwş re. Naveroka belga doktor divê ronahî û diyar be ji bo ku yên xwendevan karibin bi hasanî jê fêhm bikin bê ev mirov çi derdê wî e û çi kare bên kirin.
Carina pêwîst dibe ku mirov ji doktor re yan kesek din belgekê binivîse bêje çi mirov dixwaz e berî her tiştî di belgê de bên nivîsandin. Tiştê herî girîng ewe ku mirov bêje kîjan dahiştin pêwîstin û girîngbûna wan çiqase ye.
Nimûneyek baş bo belga doktor kar e wisa be:

- Teşxîs ser zimanê diktoriyê
- Teşxîs ser zimanê swêdî yê normal
- Nexweşiya pûçbûnê bi çi awayî ye?Nimûne:"Ew nikare daqurtîne". "Serî bi pêş de û paş de dikeve"
- Çi dahiştin pêwîstin? Nimûne:"Halîkarî ji wî/wê re pêwîst e gava xwarinê bixwe". Çi dibe gava ev dahiştin neyên dan?

Nimûne:

”Eger gepê wî mezin bin kare di qirika wî de asê bimîne û bifetise. Yarmetîder divê ku zanibe bê wê çi bike di rewşek nêzîkî fetisandinê de”. Piştî belgeyek wisa dijware ku yê berpirsiyar binivîse” Hemû zarok di vî ´emrî de pêwîstiya wan heye bi halîkariyê gava ku xwarinê bixwin”.

Çawa biriyarek yan hukmek tên îhtîraz kirin?

Eger daxwaz nama mirov qebûl nebe mirov kare îhtîraza biriyarê bike. Bi biriyarê yan bi hukmekî re divê herdem nîsandana îhtîraz kirinê hebe. Eger tune be mirov herdem kare telefon bike û yekê bixwaze. Wê tê de jî nivîsandibin berî kîjan demê mirov kare îhtîraz bike.
Mirov îhtîraza xwe dinivîsîne ji dadgeha herêmê re , lê mirov dişîne daîra kar û barê sîgortê ji bo ku ew wê biriyarê careke din ji nû ve lê binerin. Eger mirov razî nebe bi biriyara dadgeha herêmê jî, mirov kare biriyarê îhtîraz bike li dadgeha mîrî(dadgehek piçek bilintir e ji ya herêmê). Ji bo ku ev dadgeha hîn bilindtir ji nû ve li biriyarê binere, pêwîst e ku destûra ji nû ve nerînê hebe.
Lê gelekî dijware mirov destûra ji nû ve nerînê bistîne di dadgeha mîrî de.

Hukmê dadgeha mîrî û biriyara neqebûlkirina destûra ji nû ve nerînê karin bên îhtîraz kirin li dadgeha hukûmetê de.
Biriyara qebûlkirina destûra ji nû ve nerînê nikare îhtîraz bibe. Ma´na wê ewe ku eger mirov di dadgeha herêmê de qezenc bike û kesê dij îhtîraz bike û destûra ji nû ve nerînê bi dest bikeve, wê demê mirov nikare bi çi awayî raweste dijî ku ev kara here dadgeha mîrî ji bona ji nû ve nerînê.
Ji bo ku hukmek ji nû ve nerîn lê bibe di dadgeha hukûmêtê de dîsan destûra ji nû ve nerînê pêwîst e.
Gelek kêm halet digihên dadgeha hukûmetê. Hukmek yan biriyarek ji dadgeha hukûmetê nikare bê îhtîraz kirin.

Pir pêwîst e ku berî dema îhtîraz kirinê derbas bibe mirov binivîse û bêje ku mirov vê biriyarê îhtîraz dike. Carina dibe ku demek dirêjtir pêwîst e ji bo mirov bigihêje belga peyde bike yan jî ji bo mirov baş gotinên xwe dabeşbike û başbinivîse.
Mirov belkî di erê û nayê de ye derbarey tiştên mirov dixwaze binivîse di îhtîraz kirinê de.
Di wê demê de bi dest dikeve wan pêşî agahdar bike ku mirov dixwaze îhtîraz bike û di demeke pêştir de temamiya îhtîrazê bişîne.

Berî mirov dest bi nivîsandina îhtîrazê bike gerek e mirov baş biryar yan hukmê ku mirov dixwaze îhtîraz bike bixwîne û lêkolîn, kurtasî yan jî nivîsandinên din derbarey vê meselê de.
Bi vî awayî mirov kare baştir bibîne çima daxwaza mirov qebûl nebû.. Girîng e ku mirov tiştê şaş bibîne.

Eger belgeyek pêwîst be ji cimnastîk zan, mamûste, doktor yan jî kesek din, divê ku mirov wê belgê peyde bike. Ne pêwîst e mirov here dadgehê û li wê derê amade be. Lê mirov kare vî tiştî bike. Wê demê mirov di îhtîraz kirinê de dinivîse: ”Ez daxwaza got û bêjek devikî dikim”. Got û bêjek devikî başe eger ji mirov re axaftin hasanîtir be ji nivîsandinê.
Wê demê mirov kare hasanîtir diyar bike ji dadgehê re bê çi pêwîstiya mirov heye ji halîkariyê.

Mirov kare wek nimûne zarokâ ku nikare bi tenê xwarinê bixwe bi xwe re bibe û pêşwan bike bi halîkariya lalîk, kêr, çetel û kevçî. Mirov helbetê kare wergerekî bi kar bîne.

Li vê jêrê tê ronahî kirin bê çi pêwîste bên nivîsandin di îhtîraz kirinekê de:

Rubrik/Îhtîraz kirin

Datum/Dem : Sal- heyv-roj

Till/Ji : ”Dadgeha herêmê li herêma X” yan ” dadgeha mîrî li X”

Klagande/Yê ku îhtîraz dike: Li vê derê tu navê xwe dinivîsîne, paş navê xwe, jimarên te yê şexsî, cihê rûniştina te û jimara telefonê.

Saken/ Kar/mesele: Tu li vê derê dinivîsîne bê mesele derbarey çi ye, nimûne : eger diziya maşînekê be yan ne qebûlkirina daxwaza te derbarey halîkariyek aborî ji bo nexwşiya pûçbûnê.

Överklagat avgörande/Biriyar:” Biriyara belediya X sal-heyv-roj, jimara meselê” yan ” Hukmê dadgeha herêmê bi ji mara mesela X, hat gotin li X”

” Ez vê biriyarê îhtîraz dikim”

”Ez daxwaz dikim.....”

” Hoyên îhtîraz kirina min.....”

Tiştên din:

” Ez ê di demeke pêştir de temamiya îhtîraza xwe bişînim” yan ” Ez daxwaza gotû bêjeke devikî dikim”

Îmze û ronahî kirina nav.